

**Wergera Mem û Zînê ya Mela Mehmûdê Bazidî Wekî Nimûneyeke Wergera Navzimanî**  
Mela Mehmûdê Bazidî's Translation of Mem û Zîn as an Example of Intralingual Translation  
Diliçi Çeviri Bağlamında Mela Mehmûdê Bazidî'nin Mem û Zîn Çevirisi

Sami ÇELİKTAŞ\*

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî

**Received // Hatîn:** 15.03.2025

**Accepted // Pejirandin:** 10.04.2025

**Published // Weşandin:** 30.04.2025

**Pages // Rûpel:** 127-137

**DOI:** 10.55106/kurdiname.1658717

This work is licensed under the Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License (CC BY NC)

<https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/>

**Citation/Atif:** Çeliktas, Sami, *Wergera Mem û Zînê ya Mela Mehmûdê Bazidî Wekî Nimûneyeke Wergera Navzimanî*, 2025, *Kurdiname*, 12, r. 127-137

**Plagiarism/Întihal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website  
// *Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakekan va hatiye nirxandin û di malpera întihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

## Kurte

Mela Mehmûdê Bazidî di dîroka wêjeya Kurdî de pêşengekî wergerê ye û ji bilî wergerên ji zimanên wekî Erebi û Farsî, wî hin berhemên Kurdî jî wergerandine ku di çarçoveya lîteratura wergerasiyê de nimûneyên wergera navzimanî (intralingual translation) ne. Yek ji wan berhemên navborî jî mesnewiya *Mem û Zînê* ya Ehmedê Xanî ye. Mela Mehmûdê Bazidî, ev berhema ku bi cureya mesnewiyê, bi kêşa erûzê û bi şiklekî serwayî hatiye nivîsandin, bi awayekî çîrokî, kurtkirî û bi awayê pexşanê wergerandiye. Wergera Bazidî ji ber guherînên cureyî û bi taybetiya xwe ya kurtkirî derfetên dahûrandina kompozîsyona tekstê, şeweya zimanî û hûrgiliyên naverokî dabîn dike. Di vê çarçoveyê de, xebata me li dor pênasê wergera navzimanê û li gor rêbaza adaptasyonê wergera M. Mehmûdê Bazidî ji xwe re kir mijar û bi awayekî berawirdî di navbera her du tekstan de guherîn û hevtayiyên cureyî, zimanî û naverokî analîz kir. Di encama dahûrandinên me de diyar bû ku Bazidî, ji ber terciha xwe ya guhertina şewaza edebî, berhema resen bi cureyeke din û bi guhertinên berbiçav ên zimanî raguhestiye. Di gel vê guhertina cureyê yî jî, Bazidî bi giştî naveroka berhemê rast neqil kiriye û ji bilî kêmkirina hûrgiliyan kakilê çîrokê li gor berhema resen veguhastiye.

**Kilîtbêje:** Wergera navzimanî, adaptasyon, Ehmedê Xanî, Mela Mehmûdê Bazidî, Mem û Zîn.

## Abstract

Mela Mehmûdê Bazidî is recognised as a pioneering figure in the field of literary translation within the history of Kurdish literature, and in addition to his translations from Arabic and Persian, he has also translated a number of Kurdish works. Bazidî's work corresponds to intralingual translation in the literature of translation studies. One notable example is Ehmedê Xanî's *Mem û Zîn*, which was translated by Bazidî. Bazidî's translation of Xanî's work, written in the mesnevi genre, uses aruz meter and rhyme, and is presented as a short story and as abridged prose. The translation of *Mem û Zîn* by Bazidî offers a variety of possibilities for analysis in terms of textual composition, linguistic preferences and details of content, due to the change in literary genre and the fact that it is an abbreviated text. In this context, the present study has selected Mela Mehmûdê Bazidî's translation as a research topic according to the definitions of intralingual translation and adaptation technique, and has analysed the work in question in terms of equivalence and difference in terms of genre, language and content by comparing it with the source text. The analysis revealed that Bazidî reproduced the work in a different genre and linguistic context by changing the literary genre of the source text. Conversely, despite the changed literary genre of the

\* Dr., Zanîngeha Bingolê, Ziman û Edebiyata Kurdî, Tûrkiye, e-mail: [samiceliktas030@gmail.com](mailto:samiceliktas030@gmail.com), Orcid: 0009-0005-3190-7179 // Dr., Bingol University, Department of Kurdish Language and Literature, Tûrkiye, e-mail: [samiceliktas030@gmail.com](mailto:samiceliktas030@gmail.com), <https://orcid.org/0009-0005-3190-7179>

work, it was found that Bazidî translated the source text faithfully and that the essence of the story was conveyed, even if the details were lost in the translation.

**Keywords:** Intralingual translation, adaptation, Ehmedê Xanî, Mela Mehmûdê Bazidî, Mem û Zîn.

## Özet

Mela Mehmûdê Bazidî Kürt edebiyat tarihinde edebiyat çevirisinin öncülerinden biri olup Arapça ve Farsça dillerinden yaptığı çeviriler dışında bazı Kürtçe eserleri de çevirmiştir. Bazidî'nin bu çalışmaları çeviri bilim literatüründe diliçi çeviriye (intralingual translation) karşılık gelmektedir. Söz konusu eserlerden birisi de Ehmedê Xanî'nin *Mem û Zîn* adlı eseridir. Mela Mehmûdê Bazidî, Xanî'nin mesnevi türünden, aruz ölçüsüyle ve kafiyeli olarak yazdığı eserini hikaye tarzında ve kısaltılmış nesir olarak çevirmiştir. Bazidî'nin çevirisi, eserin edebi türü değiştirilerek yapılmış kısa bir çeviri olması sebebiyle metin kompozisyonu, dil tercihleri ve içerik ayrıntıları açısından çeşitli analiz imkanları sunmaktadır. Bu çerçevede, mevcut çalışmamız diliçi çeviri tanımları ve adaptasyon tekniğine göre Mela Mehmûdê Bazidî'nin çevirisini araştırma konusu olarak seçmiştir. Söz konusu eser kaynak metinle karşılaştırılarak tür, dil ve içerik açısından eşdeğerlik ve farklılıklar bağlamında analiz edilmiştir. Yaptığımız analizler sonucunda, Bazidî'nin kaynak metnin edebi türünü değiştirme tercihiyle bağlı olarak eseri farklı bir tür ve dilsel bağlamda yeniden ürettiği tespit edilmiştir. Öte yandan, eserin edebi türünde gerçekleşen değişime rağmen Bazidî'nin kaynak metni aslına uygun olarak çevirmiş olduğu ve çeviride ayrıntılar kaybolmuş olsa da hikayenin özünü aktardığı görülmüştür.

**Anahtar Kelimeler:** Diliçi çeviri, adaptasyon, Ehmedê Xanî, Mela Mehmûdê Bazidî, Mem û Zîn.

## DESTPÊK

Mela Mehmûdê Bazidî ne tenê di çand, dirok û edebiyata Kurdî de xwedî roleke giring e, herwiha tevkarîya wî ya di wergera Kurdî de jî hêjayî lêkolînê ye. Bazidî bi wergerên xwe yên navberzimanî û navzimanî wekî pêşengekî wergera Kurdî tê qebûlkirin ku wergera wî ya berhema Xanî Mem û Zîn jî yek ji wan e. Mem û Zîn wekî berhemeke şahkarê edebiyata Kurdî xwedî bandor û kartêkerîyeke berfireh e û di roja îro de jî gelek lêkolîn li ser çê dibin. Ev berhem û çîroka wê bi awayên cihê yên nivîskî û dîtbarî tîn pêşkêşkirin. Werger û adaptasyonên Mem û Zînê jî ji wan şeweyên vebikaranîn û pêşkêşkirina wê berhemê ne. Hêj di sedsala 19an de Bazidî pêwîst dîtiye ku vê metnê û çîroka wê ji çarçoveya wê ya şewazî û zimanî, ya ku li gor qebûlên sereke yên nerîta edebiyata klasîk a serdema xwe hatiye nivîsandin, wêdetir bibe û wê berhemê bigihîne xwênerên nû.

Wergera Bazidî ji ber gelek sedeman hêjayî lêkolînê ye û derfeta berawirdkirinê ya bi pêwendiyên cihê ve dide lêkolîneran. Du taybetiyên sereke yên vê wergerê hene ku sînore vê xebatê jî diyar dikin. Ya yekem, wergera Bazidî wergereke navzimanî ye û ya duyem jî ev werger wekî mînakeke wergera kurtkirî hin xasyetên rêbaza adaptasyonê dihevine. Her ku ev werger di nav heman zimanî de çê bûye û taybetiyên rêbaza adaptasyonê dide kifşe, me pêwîst dît ku em qala wergera navzimanî û xasyetên rêbaza adaptasyonê jî bikin. Di vê çarçoveyê de me cih da hin nêrînên sereke yên derbarê wergera navzimanî û adaptasyonê. Di vê xebatê de, me li gor tesnîfa wergera navzimanî û bi forma adaptasyonê du xalên nîrxandinê diyar kirin ku em çarçoveya berawirdkirina berhema Xanî û wergera Bazidî destnîşan bikin. Piştî ku em derbarê kompozîsyona metna resen û metna werger hin tespîtên xwe destnîşan bikin, em ê di gava yekem de bala xwe bidin ser tîkiliya zimanê Mem û Zîna Xanî û zimanê wergera Bazidî da ku tercîhên wergêr ên zimanî derpêş bikin. Ev nîrxandin zêdetir tîkildarî tercîhên zimanî yên wergêr e û bi vê yekê jî em armanc dikin ku guherînên zimanî yên di asta peyv, hevok û tekstê de diyar bikin û sedemên wan rave bikin. Di gava duyem de jî em ê ji hêla naverokê ve li her du metnan binêrin da ku ciyawazî û manendiyên naverokî destnîşan bikin. Ji ber ku wergera Bazidî guhartoyeke kurtkirî ya berhema Xanî ye, metna werger bivê nevê dê ji hêla naverokê ve hin hûrgiliyên metna resen li derve bihêlê. Di vê nîqteyê de me pêwîst dît ku em rave bikin bê ka Bazidî di çarçoveya cureya çîrokê de naverok çawa daxilî nav wergerê kiriye, kîjan hêmanên metna resen feda kirine û tîkiliya tercîhên wî û rêbaza adaptasyonê çi ye.



## 1. Wergera Navzimanî û Rêbaza Adaptasyonê

Çalakiya wergerê bi piranî di navbera du zimanan de pêk tê, lewma jî werger bi giştî wekî pêvajoyeke navber-zimanî tê pênasekirin. Di gel vê yekê jî, têgeheke bi navê wergera navzimanî (intralingual translation) heye ku ji hêla wergernasan ve hatiye pênasekirin û şirove li ser çê bûne. Wergera navzimanî cureyeke wergerê ye ku di nav heman zimanî de çê dibe, an ku zimanê metna jêder û ya metna armanc yek e. Herçiqas wergera navzimanî di nav heman zimanî de pêk were jî, cudatîyên têkildarî zimanê berheman, taybetîyên demkî û yên formel û cudatîyên têkildarî cureya metna jêder û ya armanc vê cureya wergerê dike mijareke berfireh. Di nav demê de diyalektên zimanan ji ber faktorên dîrokî, erdnîgarî, civakî û yên din ji hev dûr dikevin. Ji ber wan sedeman, di nav heman zimanî de pêwîstî bi ve-afirandin û adaptekirina berheman çê dibe. Wergera navzimanî di gelek nimûneyan de karê wergêr ji hêla kêşeyên xweserê wergerê ve hêsan dike û pêvajoya wergerandinê zêdetir dibe wekî lêanîneke nivîskî ya tekstê. Dîsa jî di hin nimûneyên wergeran de dûrahiya navbera teksta jêder û ya armanc rewşê pir aloz dike û pêkanîna hevtayîyê ya navbera her du tekstan dibe karekî dijwar.

Yek ji wan kesên ku cara ewil li ser têgeha wergera navzimanî rawestiyaye Jakobson (1992: 233) e ku têgeha wergera navzimanî (intra-lingual translation) wekî raguhestina nîşaneyên gotinî ya bi nîşaneyên din ên heman zimanî pênase kiriye. Gottlieb (2005: 36) wergera navzimanî bi awayekî sistematîk nîrxandîye û ew dabeş kiriye ser çar kategoriyan: 1) wergera dîakronîk (diachronic translation) ev rêbaz e ku metneke kevn piştî demekê bi kodên nû yên heman zimanî tê wergerandin. 2) wergera diyalektî cureyeke din a wergera navzimanî ye ku di navbera guhartoyên erdnîgarî, civakî û nîfşî yên heman zimanî de çê dibe. 3) wergera dîamesîk (diamesic translation) tê wateya guherîna moda zimên. Wergera ji axaftinê ber bi nivîsê mîna keke berbelav a vê kategoriye ye. 4) tîpguhezî (transliteration) jî wekî kategoriya çarem cureyeke wergera navzimanî ye û tê de guherîneke elfabeyî çê dibe.

Dodds (1985: 172-173) destnîşan dike ku wergera navzimanî gelek caran di nav sînore heman zimanî de dibe wergera ji formeke standart û bilind a ber bi formeke nizm an jî ber bi diyalektekê. Nimûneyên wergera navzimanî kêmtir di dîtin û bi piranî ji bo wergera formên kevn ên ber bi formên modern tê bikaranîn. House (2018: 182) derbarê wergera navzimanî de dibêje ku di vê proseya de metna resen bi rêya şîroveyê, venivîsînê û kurtkirinê tê guhertin, û ji ber vê çendê jî nabe ku ev beramberî "wergera edetî" bê qebûlkirin. Dîsa jî, ji bo lêkolînê ferqeke berbiçav di navbera wergera navzimanî û navberzimanî de tune. Analîza wergerê, rêbaz, keresteyên lêkolînê û pîvanên nîrxandinê di her duyan de jî kêmtir zêde eynî ye. Hem di wergera navzimanî de û hem jî di ya navberzimanî de nîrxandin di navbera metna jêder û metna armanc de çê dibe. Nêrîna Steiner (1992: 49) jî vê yekê piştrast dike, her ku dibêje çî di nav heman zimanî de çî jî di navbera zimanên cihê de, danûstandina mirovan jixwe werger e û tiştê giring ev e ku mirov zanibe xebata li ser wergerê xebateke zimanî ye.

Adaptasyon wekî formeke wergerê ji nêzik ve bi wergera navzimanî re têkildar e, ji ber ku wergera di nav heman zimanî de şert û mercên adaptasyonê zêdetir berdest dikin. Nord (1991: 28) adaptasyonê di nav sînore wergerê de terîf dike û dibêje ku di çalakiya hemî cure wergeran de adaptekirina hemanên metna jêder ya nav metna armanc bîvê nevwê çê dibe. Adaptasyon xwedî rêbazên xweserê xwe be jî, di dawiyê de pêkanîneke veguhastinê ye ku ew jî çalakiya esasî ya wergerê bi xwe ye. Shuttleworth (2014: 3-4) têgeha adaptasyonê di çarçoveya metna armanc de dinirxîne û destnîşan dike ku di adaptasyonê de stratejiyeke taybet a wergera serbest tê bikaranîn. Di vê stratejiya serbest de wergêr guhertinên berbiçav çê dike da ku metna werger li gor bendewariyên xwînerên armanc û armanca wergerê ya taybet teşe bigire.

Baker (2001: 6-8) jî diyar dike ku adaptasyon formeke wergerê ye û bi taybetî di wergera cureya şanonymeşan de tê bikaranîn. Di adaptasyonê de rêbaz û teknîkên mîna kêmkirin (omission), firehkirin (expansion), rojanekirin (updating) û hilberandinê (creation) ji hêla wergêr ve tên tetbîqkirin. Baker şert û mercên ku adaptasyonê pêwîst dikin jî destnîşan dike û di nav wan de du mercan derdixe pêş. Yek ji wan nelihevkerina rewşê ye (situational inadequacy) ku rewş û konteksta di metna resen de heyî di ya

armanc de nîn e. A duyem jî guherîna cureyî ye (genre switching), an ku ji ber sedemekê pêwîstî bi guherandina cureya metna resen çê dibe û di encama wergerê de metn dikeve nav kategoriya cureyeke nû. Landers (2001: 55-58) balê dikişîne ser ferqa navbera wergera edetî û adaptasyonê û dibêje ku di adaptasyonê de metna jêder ew qas pîroz nîn e û wergerê ku adaptasyonê dike bi qasî wergera edetî ji metna resen re dilsoziyê nîşan nade. Li gor nêrîna wî adaptasyon ji wergera edetî bêqîmetir nîn e û ew hema şeweyeke cihê yê raguestina berhema resen ya ji bo zimanê armanc e.

## 2. Mela Mehmûdê Bazidî û Wergera Mem û Zînê

Di nav lêkolînên wergera Kurdî de, ji xebatên spesîfîk ên têkildarî wergera navzimanî bêtir, lêkolînên derbarê dîroka wergerê (bnr. Pîrbal: 2002; Dost: 2009; Öpengin: 2011; Taştan: 2019; Kırcan: 2020), lêkolînên têkildarî kêşeyên wergerê (bnr. Aydoğan: 2001; Mehmûd: 2020; Açar: 2020; Nebez: 2021; Aykaç: 2022) û nivîs û gotarên ku rol û qîmeta wergerê ya ji bo ziman û edebiyata Kurdî dikin mijar (bnr. Lezgin: 2005; Çelik: 2019; Yıldırımçakar: 2021; Kan: 2024) derdikevin pêş. Bingeha wergera Kurdî bi xebatên oryantalist, mîsyoner û gerokan ava bûye (Yıldırımçakar, 2021: 81) û lewma jî werger di çarçoveyeke çandî û zimanî de û bi awayekî giştî bûye mijara lêkolînê. Nimûneyên wergerên navzimanî jî bêtir di navbera zaravayên Kurdî de û di ser berhemên edebî re çê bûne, û bi vî awayî jî derfetên xwendinê ji xwênerên Kurdî re berfireh kirine. Ji hêla din ve, wergerên di nav heman zaravayî de û yên ku bibin mînakên adaptasyonê kêmtir in. Di vê paşxaneyê heya ya wergera Kurdî de, wergera Bazidî ya bi navê *Mem û Zîn* hem wekî nimûneyeke wergera navzimanî û navzaravayî û hem jî bi xasyeta xwe ya têkildarî rêbaza adaptasyonê dibe nimûneyeke giring û berbiçav.

Di dîroka wergera Kurdî de, Mela Mehmûdê Bazidî kesayetekî pêşeng e û xebatên wî yên wegerê jî di qada xwe de nimûneyên desteya ewil in. Wergerên Bazidî hem nimûneyên wergera navberzimanî û hem jî wergerên navzimanî ne çawa ku di mînakê wergera wî ya *Mem û Zînê* de tê dîtin. Bazidî di salên 1858-1859 de, bi handana Aleksander Jaba berhema Şerefîxanê Bidlîsî "*Şerefname*" ji Farsî wergerandiye Kurdî (Ehmed, 1997: 44-45). Wergereke din a Bazidî beşek ji "*Îskendernameya*" Nizamî ye (Dost, 2009: 37). Dîsa, li gor danezanên ku Öztürk (2018: 34) dide, di nav Koleksiyona Jaba de nusxeyên bi hejmara Kurd 42 û Kurd 43 wergerên çîrokên Farsî bo Kurmancî hene ku bi destê Bazidî ve hatine wergerandin. Di vê koleksiyonê de hejmara Kurd 41 wergera Leyla Mecnûn e û Bazidî ew berhem ji Tirkî wergerandiye Kurdî. Wergera navzimanî ya *Mem û Zînê* jî nimûneyeke giring e di nav wergerên Bazidî de.

Şahkara Ehmedî Xanî *Mem û Zîn* di nav berhemên Kurdî de yek ji wan e ku herî zêde hatiye wergerandin. Nimûneyên destpêkê yên wergera *Mem û Zînê* wergerên Tirkî ne ku ji aliyê kesên mîna Ehmed Faîq, Zulfîqar Fethî û Ebdulêzîz Xalis ve hatine çêkirin (Adak: 2015). Wergerên *Mem û Zînê* yên bi zimanên din ên cîhanê jî berdest in. Wergera Îngilîzî ya Salah Sadallah, wergera Rûsî ya M. Rudenko, wergera Tirkî ya M. E. Bozarslan, wergera bi zimanê Azerî ya Şamil Esgerov û wergera Almanî ya Feryad Fazil Omar ji wan çend nimûne ne. Wergereke bi zimanê Suryanî ya *Mem û Zînê* bi navê "*Mam wa-Zîn*" di Pirtûkxaneyê Bajêr a Berlinê de bi koda Sachau 344 qeyd kiriye û destxet di 1883yan de hatiye nivîsandin û nûser ne diyar e (Subaşî û Direkçi, 2021: 1038). *Mem û Zîn* herî dawî jî bi zimanê Danîmarkî sala 2022yan bi sernavê *Mem og Zîn* û bi wergera Orhan Dogru çap bû (Çeliktaş, 2024: 66).

## 3. Dahûrandina Berawirdî ya Mem û Zînê û Wergera Bazidî

Berhema *Mem û Zînê* û wergera Bazidî bi gelek awayan dibe bê muqayesekirin, her ku biwarê wergerê ji hêla teorî, model û têgehên ve derfetên zêde pêşkêşî lêkolîneran dike. Di berawirdkirin û analîza berhema resen û wergera wê de, li gor armanc, pêşekî û pêwîstiyên lêkolîner pîvan û rêbazên cihê dibe bîr sepandin. Hevdayiya metna jêder û metna armanc bi serê xwe dikare bibe nîvengeke dahûrandinê. Lêkolîner dikare bala xwe bide ser guherînên ku di metna resen û werger de çê bûne, wekî



mînak guherînên fonetîk, sentaktîk û semantîk. Têkiliya berhema resen û ya bi wergera wê, taybetiyên kompozîsyon û zimanê berhemê û wergera wê jî xalên sereke ne di berawirdkirina wergerekê de. Herwisa têgehên wekî dilsozî û wergera serbest ku di dîroka wergerê de timî hatine nîqaşkirin wekî normên gerdûnî di nirxandinên metnên werger de dibin referansên esasî. Pîvanên wekî qebûlbarî (acceptability) rastîbûn (accuracy), herikbarî (fluency) jî dibin xalên nirxandinê da ku normên gerdûnî û kalîteya wergerekê bê destnîşankirin.

Em ê bala xwe bidin ser ziman û naveroka her du berheman û dahûrandina xwe li gor wan her du hokaran pêk bînin. Berî ku em dahûrandina ziman û naveroka her du metnan bikin, pêwîst e em çend tespîten derbarê kompozîsyona metnê ya her du berheman jî pêşkêş bikin da ku pêwendîya cudatîyên her du berheman eşkere bibe. Ji hêla kompozîsyona metnê ve di navbera Mem û Zînê û wergera wê de cudatîyên berbiçav hene. Xanî Mem û Zîn bi şiklê nezmê nivîsandiye, lêbelê wergera wê ya bi destê Bazidî bi awayê pexşanî, an ku wekî nesr çê bûye. Lefevere (1975: 42-45) derbarê wergera bi şêweya nesrê ya helbestê diyar dike ku her çi qas ev şêwe ji bo neqilkirina naverokeke rastir bêtir guncav be jî, ev rêbaz kêman wergerê pejiwandî dabîn dike, lewma jî ji bilî hin pêwîstîyan di qada wergera edebiyatê de nimûneyên wê zêde xuya nabin. Di wergera edebî de bi giştî werger li gor cure û şêwaza metna edebî ya resen tê çekirin, an ku wergera nezmê bi awayê nezmê û wergera berhemên pexşan jî bi awayê pexşanî tê çekirin. Her çi qas wekî rêbaz neyê pejiwandî jî, nimûneyên wergerê yê navbera cureyên edebî hene, lewma jî karê ku Bazidî pêk aniye tiştêkî deredetî nîn e.

Bazidî (2007: 23) di hevoka yekem de agahiyên derbarê Mem û Zînê de dide û dibêje ku şairê Kurmancan ê bi navê Ehmedî Xanî ev berhem di tarîxa hezar û şeşsedî de, li Bazidê bi wezn bi navê Mem û Zînê telif kiriye. Destnîşankirina teksta resen a wekî "wezn" agahdariyeke giring e ku Bazidî dide xwînerê vê metnê. Ev yek tercîha wî ya guhertina şêwaz û cureya berhemê jî dupat dike. Metna resen li gor cureya mesnewiyê û bi kêşa erûzê hatiye nivîsandin û xwedî taybetiyeke serwayî ye. Cudatiyeke din jî têkildarî dirêjîya metna resen û wergera wê ye. Mem û Zîn bi tevahî nêzikî 2656 malik e. Her malik di navbera 8 û 12 peyvên pêk hatiye û bi hesabekî giştî Mem û Zîn mesnewiyek li dor 26 hezar peyv e. Ji hêla din ve wergera Mem û Zînê wekî kurtiyeke metna resen e û balê dibe ser bûyerên sereke yê çîrokê. Bi awayekî eşkere diyar dibe ku werger ji metna resen pir kurtir e. Mîmkun e ku wergêr wekî bedela kurtkirinê hin taybetiyên berhemê feda kirine, hin bûyer jê kêman kirine û cih nedaye şîroveyên Xanî yê di metna resen de.

### 3.1. Hevtayîya Zimanî ya Her Du Berheman

Bazidî di wergera Mem û Zînê de du biryarên giring dane ku bandor li ser zimanê metna armanc çê kiriye. Ya yekem, Bazidî zimanê helbestî bi awayekî pexşanî wergerandiye û ya duyem jî wî metn bi awayekî kurt wergerandiye. Ji ber wan tercîhên wergêr, teşeya zimanî hem di asta peyv û hevokan de û hem jî di tevahiya tekstê de tûşî guherînan bûye. Mem û Zîn ji hêla hunerên ciwankariyê ve metneke zengîn e û tê de gelek nimûneyên hunerên zimanî û vegêranî yê wekî cînas, tezat, telmîh, tenasûb, kînaye, teşbîh û yê din hene (Cîhanî, 2013: 39-53) ku xasyetên zimanî û estetik yê cureya şîra klasîk in. Zimanê Mem û Zînê yê ku xasyetên edebiyata klasîk dide nîşandan, bi tercîhên Bazidî veguheriye ser vegêraneke li gor forma edebiyata gelêrî. Wekî mînak, di Mem û Zînê de behsa Newrozê wiha derbas dibe:

Weqtê we ku şexsuwarê xawer

Tehwîlî dikir di mahê Azer

Ye'nî ku dihate burcê sersal

Qet kes nedima di mesken û mal

Roja ku dibûye Îdê Newrûz

Te'zîmî ji bo dema dilefrûz (Yıldırım: 123).

Cejna Newrozê di wergera Bazidî de bi formeke pexşanî û çîrokî ya nêzikî zimanê gel tê veguhêstin:

Di wî wext û zemanî de sersal dikirin. Wê rojê, ehali û xelkê bajêr, hemû feqîr û dewlemend, mezin û biçûk, nêr û mê, imûmî ji bo geşt û geryanê, bi derve diçûne deşt û sehrayê. (Bazidî: 24).

Xuya ye ku Bazidî li ser ciyawaziya zimanî û vegêranî ya her du metnan fikiriye û hewl daye metna xwe bi hin awayan nêzikî metna resen bike. Di wergera Mem û Zînê de Bazidî bi rêya bikaranîna gihaneka "û"yê û bi pevgirêdana rengdêr û navdêrên hevdeng û hevwater xwestiye şêwaza xwe ya pexşanî nêzikî şêwaza Xanî ya helbestî bike:

Êdî gav bi gav ketine agirê **eşq û muhebetê**, roj bi rojê **coş û xiroş** dikirin. Ew her du jî **zar û zeîf** bûyî, **şev û rojan hawar û gazî** dikirin û halêd wan perişan bû. (Bazidî: 28).

Bazidî, ji bilî dubarekirina peyvên hevdeng û hevwater, di sazkirina hevokên xwe de jî formeke sentaktîk a nêzikî şêwaza helbestê tercîh kiriye:

Dayînekî wan î pîr, ecûze, salxurî û dinyadîtî û di imûrê dinyayê zehif îdrak û pir finûn bi navê Mîzebûn hebû. (Bazidî: 28).

Di Mem û Zînê de peyv û qalibên Erebi jî ber taybetiya şîra klasîk a serdemê û jî ber sedemên cihê yên civakî, çandî û dînî zêde ne. Bazidî herçiqas cureya berhemê di wergera xwe de guhertibe û derfetên vegêrana nesrê jê re çêbûbe jî, di metna werger de cih daye gotinên Erebi:

Ji du keçan çî hasil dibe eger **fî el waqî** êd we dît eger kur dibin (Bazidî: 29)

Li ser vê xeberê, **tebdîl el libas** bû, xwe xiste libasê hekîman, çû cihê ku Tacdîn û Mem li wê bûn. (Bazidî: 30).

Mem û Zîn riswa bûyî, **telef el nefis** dibin û bixeyrî ji wê zehif fitne û fesad jî bi vê sebebê peyda dibe. (Bazidî: 35).

Bazidî bi zimanekî çîrokî zimanê Mem û Zînê honandiye û lewma dikarî derfeta vegêrana gelêrî ya sade bi peyvên Kurdî yên resen bi kar bianiya. Sedemên vê tercîha Bazidî jî sînoren vê gotarê wêdetir û hêjayî lêkolîneke cihê ye, lewma em ê tenê bi tespîta vê yekê nirxandina xwe sînordar bikin.

Peyv û gotinên Erebi yên ku di metna resen û metna werger de hevpar in jî aliyekê ve jî di navbera her du metnan de hevgiriyekê çê dîkin. Di navbera nivîsîna Mem û Zînê û wergera Bazidî de nêzikî sed û pêncî sal hebe jî, bi wan peyv û gotinên hevpar ên Erebi berdewamiyek di navbera her du metnan de çê bûye.

Ji kenarê din em bîne **ehwalê** Sîtî û Zînê. ....Ew Dayîn ku halêd wan wiha perişan dît, kete şîbhê û sebebê perişanî **melala ehwalê** di wan pirsîyar kir. Ji **ibtîda** ewan rêya înkare girt. Paşê Dayîn ji bo wan **weid û weid** kir...(Bazidî: 28)

Di gel vê yekê jî, diyar e ku Bazidî hin peyvên aîdî serdema xwe li şûna peyvên ku Xanî tercîh kiriye bi kar aniye. Xanî dema pênaseya Mîr dide, wî wekî padişahê serwerê Rom, Erebi û Eceman bi nav dike. Lê Bazidî du peyvên cihê bi kar anîne ku diyar e di serdema wî de bêtir têgîner û rasteqîn xuya dîkin da ku serweriya Mîr rave bike:

...herçî taîfeya Kurmancan ku hebû di nav wan de wekî **qiralekî bixoser**; mîr Zeyneddîn nav mîrekî bi nav û şan... (Bazidî: 23).

Bazidî, hin axaftinên karakteran ne tê de, bi giştî bûyeran bi dema borî vediguhêze, lêbelê Xanî di Mem û Zînê de forma dema niha û ya borî bi awayekî lêkdayî şixulandiye. Di wergerê de axaftinên karakteran bi pîranî bi awayekî nerasterast jî hêla vegêrê kesê sêyem tîr neqilkirin, lêbelê cih bi cih bi xêza axaftinê an jî di nav dunikê de karakter rasterast jî diaxivin.



Melayê remal gava ku fikirî li şiklê remlê, navê Sityê digel Tacdîn û navê Zînê digel Memo dît. Wekî ehwal ji remlê zanî, gote dayînê:

- Ji bo çi diro dibêjî? Bi derewan şuxil nayê te dîtin (Bazidî: 29).

Mîr berê bawer nekir ku eslê vê xeberê dê nebe. "Ez zêde Tacdîn û Memoyî hez dikim. Ew jî şûlêd wiha nelayiq nakin û kirina wan qet tesewir nakim."

Şêweya zimanî ya Mem û Zînê û şêwaza Xanî di seranserê berhemê de hevgir e û naguhere. Di şêweya zimanê wergerê de hem awayekî zimanê edebî û hem jî awayê zimanê rojane diyar dibe. Bi heman awayî, di xitaba Beko ya bi Mîr de jî hem mînakên awayê rêzgirtinê "hûn" û hem jî awayî samîmî "tu" di metnê de xuya dibin. Di mînaka jêr de Beko bi şêweyeke sistambar û samîmî xitabî Mîr dike:

- Ey birê, ku dana Sitî be Tacdîn şûlekê ne layiq bû, lakîn her çi ye, **te** ew da; çû begzade ye (Bazidî: 32).

Di mînakeke din de jî Beko bi awayekî formel û bi zimanekî dîplomatîk xitabî Mîr dike:

Min fikir kiriye **hûn** wisanî bikin ji wê jî kesrê namûs û îtibara we nabîtin! (Bazidî: 40).

### 3.2. Manendî û Cudatiyên ji Hêla Naverokê ve

Di wergerê de raguhestina naverokê ya rast xaleke giring e ku ji wergêr tê hêvîkirin. Herwiha li gor Nîda û Taber (1982: 13) divê armanca sereke ya wergerê 'hilberandina ji nû ve ya peyama berhemê' be û ji bo pêkanîna vê armancê jî wergêr tercîhên rêzimanî û peyvîkî yên guncav dike. Di çarçoveya vê nêrînê de, diyar e ku Bazidî armanc kiriye peyama sereke ya berhema Mem û Zînê, an ku çîroka ku Xanî vegotiye, neqil bike.

Ji hêla din ve, Xanî di wan malikên jêr de niyeta xwe û peyama xwe ya esasî ji çîroka Memê û Zînê cihê dike:

Şerha xemê dil bikim fesane

Zînê û Memê bikim behane (Yıldırım: 167).

Eger ku em niyeta Xanî û peyama Mem û Zînê ya esasî wekî ya di malikên jor de qebûl bikin, wê demê armanca neqilkirina niyeta xwediyê berhemê di wergerê de bi awayekî tam pêk nayê. Ev jî di encama tercîhên Bazidî de derdikeve holê, lewre wergêr bi rêya kêmkirina wan beşên ku têkildarî niyeta Xanî û armanca wî ya nivîsînê ne li derve hiştiye.

Di paragrafa dawî ya wergerê de Bazidî diyar dike ku wî berhema Mem û Zînê bi kurtî raguhestiye û tiştê ku ji destê wê hatiye ev e:

Ev e li ser wechê kurtî û ixtisarê, zibda kitêba mem û Zînê. (Bazidî: 46)

Bazidî derbarê rastiya tiştên ku wî neqil kirine jî para gumanê dihêle û dibêje ku serpêhatiya Mem û Zînê heşt sed sal berî wî qewimiye û mirov nikare rastiya hemî tiştê bizane:

Edî, rastî cenaba Xudê teala bi xwe dizane, alim el sir we el xefaya her ew e (Bazidî: 46).

Bazidî di wergera xwe de cih nedaye 6 beşên destpêkê yên Mem û Zînê ku wekî beşên dibace, ne't, munacat û yên din tên zanîn. Di beşa heftem a Mem û Zînê de Xanî behsê tîne ser mijara çîrokê û niyeta xwe ya nivîsandinê. Bazidî bi çend peyvên vê beşê tilnîşan dike û piştî derbasî çîrokê dibe:

...hezretî Ehmedê Xanî kitêba ku telif kiriye bi wezn bi navê Mem û Zînê, aşiq û maşûq, li wechê muxtesr beyana wan dike (Bazidî: 23).

Destpêka wergera Mem û Zînê ya Bazidî beramberî beşa heştam a Mem û Zînê tê ku di vê beşê de Xanî bi Ne'ta Mîr Zeynedîn û bi wesfdayîna Mem û Zînê dest bi çîrokê dike:

Go: "Padişahêk zemanê sabîq

Rabû di hukûmeta xwe faîq

Textê wî Cizîr û bexti mes'ûd

Talî' qewî û meqamê mehmûd (Yıldırım: 171).

Bazidî di wergera xwe de li gor rêza ku Xanî di Mem û Zînê de neqil dike behsê li bûyeran vedike. Bazidî cih dide bûyerên sereke, qonaxên giring û tevkarîya karakterên nav metnê, lêbelê ji ber qewareya kurt a metna werger hin hûrgiliyên berbiçav ên bûyeran jî winda bûne. Wekî mînak, ji beşa 36ê ta beşa 40ê ya Mem Zînê tenêtiya Mem û Zînê, çûna Mîr û xelkê bi wî re ya nêçîrê, hevdîtina Mem û Zînê ya li nav baxçeyê qesra Mîr û vegera ji nêçîrê û bûyerên piştî wê tîrî ravekirin. Bazidî wan bûyeran bi kurtî dibêje û hûrgiliyên hevdîtîna jê kêr dike:

Rojekê mîr digel nedîm etbaên xwe çûne nêçîrê; ew baxçe wiha musmîr, vala mabû... Mem û Zîn di nav rezî de liqayî hev bûn (Bazidî: 33). ...Qezay nagîhanî, mîr Zeyneddîn nêzikî êvarê ji nêçîrê zivirî, wiha rast hate baxî. Li ber derê wê qesra melûm ji hespî peyabû. (Bazidî: 34).

Di wergera Bazidî de karakterên sereke di nav vegêranê de tev diyar dibin û Bazidî bi kurtî be jî rola wan destnîşan dike. Bazidî jî her wekî Xanî çîrokê li dor Mem û Zînê neqil dike. Herwiha, karakterên ku bandora wan li ser geşedana bûyeran çê dibe, bi rol û fonksiyonên xwe yê esasî di wergerê de tîrî pêşkêşkirin.

Ji hêla binyada malbatî û nijada Mîr Zeyneddîn ve pênaseya Xanî û danasîna Bazidî li hev tîrî. Xanî derbarê Mîr de wiha dibêje:

Abaê 'îzam û cedd û walid  
Mensûb û muselselêd Xalid

Zîbendeê mulk û zeynê dîn bû  
Navê wî emîrî Zeyneddîn bû (Yıldırım: 172).

Bazidî jî li gor metna jêder di wergerê de terîfa Mîr Zeyneddîn dide:

...ji silsîla Hezretî Xalid, bixoser..., di Cizîr û etrafê wê de,..... mîr Zeyneddîn nav mîrekî bi nav û şan... (Bazidî: 23).

Beko di Mem û Zînê de xwedî roleke sereke ye û Xanî ew kesayet bi fonksiyonên pirhêl rave kiriye. Di wergera Bazidî de jî Beko ji bo vegêrana çîrokê û pêşkêşkirina kêşeyên sereke yê çîroksaziyê xwedî roleke giring e:

Mîr Zeyneddîn dergevanekî heremê hebû, qewî heramza û muftîn û tilbîs, navê wî Bekir bû. Ew heramza mexsûs ji hesed û dexes û nîfaqê di vî şûlê de direft (Bazidî: 32).

Lêbelê binavkirina Beko ya bi wesfên neyînî yê wekî "heramza", "muftîn" û "tilbîs" rol û kesayetiya wî ya neyekpare ya li ba Xanî vedîşere û wî wekî kesayetekekî mişt xirab û rola wî jî wekî ya xirabiyê destnîşan dike.

Ji hêla din ve, di Mem û Zînê de Xanî cih daye navên şexsiyetên dîrokî, hêmanên mîtolojîk û sembolîk, navên cureyên nebatan, navên stêrkan hwd. ku di heman demê de parçeyeke naveroka metnê ne (Yıldırım, 2016: 65-102). Di Mem û Zînê de Xanî bi hûrgilî behsa musîqayê, amûr û meqamên wê dike û wan hûrgiliyan bi rewşa lehengên xwe re tîkildar dike û bi wan rengêkî dide ton û atmosfera metnê (Çeliktaş, 2021: 383-389). Di wergera Bazidî de ev hêmanên dîrokî û çandî diyar nabin û di encamê de jî werger ji temsîla zengîniya metna resen bêpar dimîne.

## Encam

Berevajî lêkolînên giştî yê di biwarê wergera Kurdî de, nîvenga xebata me metna edebî bû û lewma jî me encamên şênber derbarê metna wergerê de bi dest xistin. Bi rêya diyarkirina çarçoveyeke teorîk, bi nirxandina metneke wergerê ya li dor vî çarçoveyê û bi dahûrandineke berawirdî ya metna resen û metna werger, ev xebat dê encam û daneyên kêrhatî pêşkêşî qada wergera edebî ya Kurdî bike û dê xebatên pêşerojê yê wihareng teşwîq bike. Di analîza me ya berawirdî de, ku me mesnewiya Mem û Zînê û wergera Bazidî li gor tîgehên *wergera navzimanî* û *adaptasyonê* rûberî hev kir, em gihîştin wan encamên berbiçav: Mela Mehmûdê Bazidî di wergera Mem û Zînê de cureya metna resen guhertiye û ji ber vî tercîha wergêr berawirdkirina me ya metna resen û wergera wê jî ji çarçoveya cure û şewaza helbestê bêtir, li dor neqilkirina navbera du cureyên cihê yê edebî pêk hat. Di encama dahûrandina vî xebatê de, diyar bû ku



wergera Bazidî ji bo bidestxistina daneyên têkildarî naverokê, guherînên zimanî û kompozîsyona metnê berhemeke guncav e. Wergera Bazidî mercên wergera navzimanî ya ku bi rêbaza adaptasyonê çê bûye temsîl dike û bi awayekî eşkere tê dîtin ku Bazidî teksteke kurtekirî û kêmkirî dahênaye. Di gel ku metn rastî kêmkirin û kurtkirinê hatibe jî, Bazidî naverok û çîroksaziya metna resen parastîye. Di encama kurtkirinê de berhema werger li gor a resen ji hêla referansên çandî ve pir teng bûye. Di wergerê de derfeta tilnîşana şexsiyetên dîrokî û efsaneyî, hêmanên curbicur û ên erdî û asîmanî çê nebûye.

Wergera Bazidî nabe ku ji ber pêwîstiya guherîna zimanî ya dîrokî derketibe holê, lewre di navbera serdema Xanî û Bazidî de demeke dirêj nîn e û Kurdiya nivîskî ya serdema Bazidî jî bi giştî wekî ya serdema Xanî ye. Li gor pênaseya Gottlieb wergera Bazidî her çi qas diakronîk be jî, pêwîstiya wergerê ji ciyawaziya zimanê serdema Xanî û Bazidî bêtir, ji veafirandina metnê ya ji bo armanceke spesîfîk derketiye holê. Di encama dahûrandina vê xebatê de diyar bû ku wergera Mem û Zînê ya Bazidî taybetiyên wergera navzimanî nîşan dide, her ku di nav heman ziman û şêwezarî de, bi awayekî paşdemî, bi heman tîpan û di heman konteksta civakî de hatiye raguhestin. Herwisa, ev werger xwedî xasyetên forma adaptasyonê ye jî, lewre di analîzên me de bi mînakên kifşe bû ku teknîkên adaptasyonê yên wekî kêmkirin, rojanekirin û afirandinê di wergerê de peyda bûn. Di wergera Mem û Zînê de her çi qas ciyawaziyeke konteksta metna resen û ya werger mewzûbehs nebe jî, şertê guhertina cureya edebî pêk hatiye û ev jî xasyeteke metnê ye ku wê dike mînakeke adaptasyonê.

Di gel ku Mem û Zîn berhemeke edebiyata klasîk a Kurdî ye, wergera Bazidî ji ber tercîhên wergêr ên zimanî ketiye nav sînorê edebiyata gelêrî. Ji hêla din ve, her çi qas cureya berhemê ya edebî guherîbe jî, fonksiyona zimanî wekî xwe maye, an ku wergera Mem û Zînê her wekî berhema resen li gor fonksiyona zimên bûye metneke derbirînî (expressive) ku xasyeta sereke ya zimanî ya berhemên edebî ye. Wergera Bazidî heta dereceyeke bilind wergereke qebûlbar, rast û dilsoz e, her ku wergêr naveroka berhema resen bi awayekî têgîner û rast di metna werger de pêşkêş kiriye. Dîsa jî, divê em diyar bikin ku wekî berhemeke edebî Mem û Zîn hem bi şêwaza xwe ya cureyî û hem jî bi naveroka xwe xwedî kompozîsyoneke temam e, lêbelê wergera Bazidî ji şêwazeke edebî bêtir di temsîla naveroka berhema resen de serkeftî xuya dike. Helwesta Bazidî ya neqilkirina naveroka berhemê ya bêyî guhertinên berbiçav wekî helwesteke dilsoz a wergêr xuya dibe.

## ÇAVKANÎ / REFERENCES

- Açar, Z. (2020). "Wergera ji Tirkî bo Kurdî û Bikaranîna Hin Peyv û Qalibên Girîng ên Kurdî di Wergerê de". *Kurdiyat*. Sal 2020. Hejmar 1. r. 83-103.
- Adak, A. (2015). "Li Gorî Serdemên Tarîxî Têkiliyên di Navbera Edebiyatên Kurdî û Tirkî yê Klasîk de. Sempozyuma Edebiyata Berawirdî "Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî". *Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları*. Mêrdîn, r. 75-110.
- Aykaç, Y. (2022). "Kêşeya Wergera Biwêj û Gotinên Pêşyan Di Navbera Tirkî û Kurdî De". *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl: 7, Cilt: 7, Sayı: 14, ss. 69-83).
- Aydoğan, M. (2001). "Werger hinerek e". *Nûdem*. hejmar 38, r. 114-143.
- Baker, M. (2001). *Routledge Encyclopedia of Translation Studies*, Routledge. London & New York.
- Bazîdî, M. Mehmûd. (2007). *Mem û Zîn*. Weşanxaneya Lîs. Amed.
- Cîhanî, P. (2013). Şiroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî. Weşanên Nûbihar. Stenbol.
- Çelik, B. (2019). "Translation in the Kurdish magazine Hawar, The making and legitimization of a cultural identity". *Translation and Interpreting Studies* 12: 2 (2019). pp. 283-305.
- Çeliktaş, S. (2021). "Mûsîqa di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de". Di nav *Xanînasî* de. Ed.: A. Timurtaş; M. Zahir Ertekin; A. Tek. Weşanxaneya Peywend. Wan.
- Çeliktaş, S. (2024). *Wergera Edebî di Kurdî de: Dahûrandinek li dor Modela Wergerê ya Christiane Nord'ê*. Teza Doktorayê. Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî.
- Dodds, John M. (1985). *The Theory and Practice of Text Analysis and Translation Criticism*. Vol. 1. Campanotto Editore. Udine, Italy.
- Dost, J. (2009). "Pêşengê wergera bi kurdî: Mela Mehmûdê Bayezîdî". *Tîroj*. Sal 7. Hejmar 40, 2009. Stenbol. r. 36-37.
- Ehmed, K. Mezher. (1997). "Şerefname di Kurdnasiya Sovyetê de". *Nûdem*. Hejmar 22, havîn 1997, r. 44-45.
- Gottlieb, H. (2005). "Multidimensional Translation: Semantics turned Semiotics". *EU-High-level Scientific Conference Series*. Copenhagen.
- House, J. (2018). *Translation, the basics*. Routledge. New York.
- Jakobson, R. (1959). "On Linguistics Aspects of Translation". *On Translation*. Edited by R. A. Drawer. Harvard University Press, Cambridge. p. 232-239.
- Kan, G. (2024). "Ji Perspektîfa Teoriya Polîsîstemê Rol û Karîgeriya Wergêranê di Geşadana Edebiyata Kurdî da". *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. 2024 12 (1) 33-49.



- Kırkan, A. (2020). "Kur'anı Kerim'in Kürtçe Tercümeleri ve Zazaca İlk Kur'an-ı Kerim Tercümesinin Dilbilimsel Analizi". *Artuklu Akademi* 7(2), Kasım 2020.
- Landers, Clifford E. (2001). *Literary Translation -A Practical Guide-*. Multilingual Matters. Clevedon.
- Lefevere, A. (1975). *Translating Poetry: Seven Strategies and a Blueprint*. Van Gorcum. Amsterdam.
- Lezgîn, R. (2005). "Tercume û Aversîyayîşê Ziwanî De Rola Tercumeyî". *Kovara Bîr*. Hejmar 3. Payîz.
- Mehmûd, B. (2020). "Pirsgirêka Têrmsazîyê Di Pêvajoya Wergêrana Kurdî De". *Kovara Şermola*. Hejmar 8. Payîz 2020. r. 15-25.
- Nebez, C. (2021). *Wergerandin Huner e*. Kurmancîkirin: Muhsîn Ozdemîr-Brahîm Ronîzer. Weşanxaneya Sîtav. Wan.
- Nida, E.; Taber, Charles R. (1982). *The Theory and Practice of Translation*. Published for the United Bible Societies by E. J. Brill. Leiden, the Netherlands.
- Nord, C. (1991). *Text Analysis in Translation, Theory Methodology, and Didactic Application of a Model for Translation-Oriented Text Analysis*, Amsterdamer Publikationen zur Sprache und Literatur.
- Öpengin, E. (2011). "Bizava Wergerê di Kurmanciyê de", *In Proceedings of first international conference on Kurdish Literature*, xxx. Sanandaj. University of Kurdistan Press, 4.
- Öztürk, M. (2018). "Çîrokên Werger Ên Mela Mehmûdê Bazidî (1797-1870)". *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*. Yıl: 4, Cilt: 4, Sayı: 8, 2018/2, ss.33-63.
- Pîrbal, F. (2002). *Mêjûy Wergêranî Kurdî*. Çapxaney Wezaretî Perwerde. Hewlêr.
- Shuttleworth, M. (2014). *Dictionary of Translation Studies*. Routledge. London & New York.
- Steiner, G. (1992). *After Babel: Aspects of the Language and Translation*. Open Road Publication. New York.
- Subaşî, K., Direkçi, L. "Wergereke ji Erebi bo Fellihi û Kurdî-Gerşûnî di Koleksiyona Eduard Sachau de (Çîroka Sed û Şêst û Duyem a Hezar û Yek Şevê)". *Şarkiyat* 13/3 (Aralık 2021), 1034-1057. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.989490>.
- Taştan, Y. (2019). *Dîroka Wergerê û Xebatên Wergera Kurdî*. Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstituya Zimanên Zindî. (Teza Masterê ya Neçapkirî).
- Yıldırım, K. (2016). *Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlil*. Weşanên Avesta. Stenbol.
- Yıldırımçakar, Z. (2021). *Werger Wek Kirineke Çandî: li ser rêyên ji wergernasiyê ber bi kurdolojiyê ve*. Weşanên Peywend. Wan.